DEYNÊ NAVMALÎYÊ

FAKTABLAD CSN KURMANJI

MAFÊ KÊ HEYE DEYN BIKE Û JI BO ÇI?

Penaber û hin biyanîyên din dikarin deynê navmalîyê bixwazin. Divê tu, li gel hin tiştên din, ji wan penaberan bî yên ku hatine wergitin yan li Daîreya karî qeydkirî û mafê te yê standina bedela guncandinê hebe ji bo ku tu deynî bistînî. Divê tu 18-salî jî bûbî gava belediyeyekê tu caran pêşîn qebûl kiribûyî.

Deyn ji bona kirîna alavên metbexê û mobîlyeyan û tiştên din e. Çênabe pere ji bo tiştên wek xwarin û kirêyê bên bi kar anîn.

EZ KENGÊ DIKARIN DEYN BIKIM?

Herî dereng tu dikarî di nava du salan de ji roja ku belediyeyekê tu cara pêşîn qebûl kiribûyî deynî bixwazî. Heman tişt ji bo xwastina îlaweyê li ser deynî pêştir derbaz dibe.

EZ ÇI QAS DIKARIM DEYN BIKIM?

Mezinhaîyê malbatê, ka zarok di malê de hene yan na, ka te xanîyî bi mobîlye yan bê mobîlye kirê kiriye, yan ka tu di nav mala kesên din dijî yan na mezinahîya deynî tayîn dikin. Tu her gav dikarî meblexeka kêmtir ji ya herî mezin deyn bikî. Heger tu bi awayekê şibhî zewacê (jin, mêr, hevjîn yan yar) dijî, divê hûn bi hev re deynî bixwazin. Hingê hûn dê bi piştgirî ji deynî berpirsyar bin. Ango, hûn her du bi hev re ji vegerandina deynî berpirsyar in.
Ev berpirsyarîya we ya mişterek dê dom bike tevî ku hûn paştir ji hev veqetin û cuda bijîn.

Hejmara kesan	Bênavmalî Hedê herî mezin yê meblexê bi kronan	Binavmalî/ di nav mala kesê din de
1 mezin	10 000	5 000
1 mezin + 1 zarok	20 000	5 000
1 mezin + 2 zarok	25 000	5 000
1 mezin + 3 zarok	30 000	5 000
1 mezin + 4 zarok yan zêdetir	35 000	5 000
2 mezin	15 000	5 000
2 mezin + 1 zarok	25 000	5 000
2 mezin + 2 zarok	30 000	5 000
2 mezin + 3 zarok yan zêdetir	35 000	5 000

EZ ÇAWA DEYNÎ BIXWAZIM?

Rêya herî hêsan ew e ku tu ji miamelekarê xwe yê li Daîreya karî yan daîreya pêşwazîkirina penaberan li belediyeyê bixwazî ku alîkarîya te bike.

Miamelekarê te alîkarîya te dike ku tu daxwaznameyê dagirî û agahdarîyên li ser şert û qaîdeyên deynî dide. Paşî miamelekar daxwaznameyê ji CSNê re dişîne

MIN DEYNEK WERGIRTIYE, HEQÊ MIN HEYE BÊTIR DEYN BIKIM?

Tu dikarî bêtir deynî bixwazî heger

- te pêştir ji heqê xwe kêmtir deyn kiribe
- tu êdî ne kirêdar bî di mala kesekê din de yan tu ji xanîyekê binavmalî biçî xanîyekê bênavmalî
- zarokek ku li Swêdê ji dayik bibe li malbatê zêde bibe
- mirovekê te yên lêzim, ku ew jî ji wan penaberan be yên ku belediye qebûl dikin yan bedela guncandinê distîne, were Swêdê. Mêr, jin, hevjîn û zarokê ji 21 salan biçûktir mirovên lêzim in.

Heger tu û mêr, jin yan hevjîn bi hev re deyn bikin, hûn bi hev ji bo vegerandina hemû deynî berpirsyar dibin.

HEQÊ PLANKIRINÊ

300 kron wek heqê plankirinê yekser ji deynî tên birîn. Heqê plankirinê yê deynê îlawkirî 100 kron e.

PERE ÇAWA TÊN DAN?

CSN deynî bi rêya Swedbankê dide. Pere bi rêya *çekê yan hesaba te* tên dan. Hesab dikare li Swedbankê yan bankeka din be. *Ji bo ku pere bên ser hesaba te, divê tu peywendîyê bi Swedbankê bikî û jê re bibêjî ka pere werin kîjan hesabê.*

DEYNÎ KENGÎ DÊ BÊ VEGERANDIN?

Tu dê du salan piştî peredana pêşîn dest pê bikî deynî vegerînî. Heger tu li gor plana peredanê ya adetî pereyan bidî, vegerandina deynî 1 heta 7 salan dom dike.

FAÎZA/FEYDEYA DEYNÎ ÇAWA TÊ HESAB KIRIN?

Gava deynê pêşîn tê dan, yekser faîz/feyde tê hesab kirin. Feydeya du salên pêşîyê li ser deynî tê zêde kirin gava tu piştî du salan dest bi vegerandina deynî dikî. Piştre feydeya nesabit li ser meblexa nû ya deynî tê hesab kirin. Tu dikarî di www.csn.se de bibînî ka ji bo her salê feyde çi qas e. Hikûmet feydeyê tesbît dike.

EZ DÊ ÇAWA DEYNÎ BIDIM?

CSN piştî du salan fatûreyên pêşîn dişîne. Adeten tu deynî her mehê didî. Ka te çi qas deyn kiriye diyar dike ka tu dê çi qasê bidî. Heger tu di wextê diyarkirî de nedî, em hişyarnameyekê dişînin.

EZ DIKARIM ZÊDETIR BIDIM?

Tu dikarî di nava du salên pêşîyê dest pê bikî deynî bidî. Tu dikarî jî peredanên zêdetir bidî da deynî zûtir bidî.

EZ ÇI BIKIM HEGER NIKARIM DEYNÎ BIDIM?

Heger tu nikaribî deynî bidî ji ber ku dahata te kêm e, tu dikarî daxwazê bikî ku tu meblexeka kêmtir (deyndana kêmkirî) bidî yan jî peredanê rawestînî (paşdexistin). Mezinahîya malbatê û dahata salane tayîn dike ka deyndana kêmkirî yan paşdexistin heqê te ye. Her car biryar ji bo salekê ye. Feyde tê hesab kirin tevî ku tu deynî nedî jî. Lewra deynê te zêde dibe heger tu vegerandina wî rawestînî. Hin qaîdeyên din ji bo paşdexistinê hene heger tu li Swêdê nebî. CSN dikare agahdarîyên zêdetir li ser wan qaîdeyan bide.

ÎMKAN HEYE KU DEYN BÊ JÊ BIRIN?

Heger CSN biryarê bide ku ji bo mideteka dirêj di paşerojê de îmkana te ya vegerandina deynî tine ye, mimkin e deyn bi yekcarî bê jê birin. Sebeb dikare bo nimûne nexweşîyeka domdirêj be yan emirê mezin û dahata kêm be. Ji ber wefatkirinê deyn otomatîk tê jê birin.

MALPER

Agahdarîyên zêdetir li ser deynê navmalîyê di www.csn.se de hene.

CSN 400 1H/1703

Ev zanyarîname hatiye wergerandin bo zimanê erebî, îngilîzî, fransî, kurmancî, paşto, farsî, rûsî, somalî, soranî, tîgrînî Semantix ji wergeran berpirsyar e.

GUHERÎNA NAVNÎŞANÊ

Heger tu di nav Swêdê de cihê xwe biguhorî, tu dê navnîşana nû bidî qeyda nifûsê. Baş dibe ku tu CSNê jî pê agahdar bikî. Divê tu navnîşana nû ya derveyî welatî yekser bidî CSNê. Tu dikarî kartên navnîşanaê ji CSN bixwazî.

AGAHDARÎYÊN ZÊDETIR

CSN, Hemutrustningslån [Deynê navmalîyê], 851 82 SUNDSVALL
agahdarîyên zêdetir dide.
Telefon: 0771-276 100
Demê telefonkirinê: 9.00–12.00
Faks: 060-18 60 06
E-poste: hemutrustningslan@csn.se
Malper: www.csn.se